

NÎŞEYA AGAHİYÊ DERBARÊ MAFÊN PENABERAN DE Lİ DİJÎ TUNDİYA ZAYENDÎ Û TUNDİYA Lİ SER ZAYENDA CİVAKÎ

PARÊZER MAHMUT ŞEREN

Tebax 2021

NAVEROK

MAFÊ PARASTİNA Jİ TUNDİYÊ.....2
PEYMANA STENBOLÊ.....3
PÊŞÎGİRTİNA TUNDİYÊ Û PARASTİNA Lİ DİJÎ TUNDİYÊ....4
CEZAKİRİNA KİRYARÊ ŞÎDETÊ.....7
BIYANİ Û HİQÛQA PARASTİNA NAVNETEWEYÎ.....7
ZÎYANŞÛNDEDANİYA ZİRARA HATÎ DAYÎN.....8
MAFÊ SÛDMENDBÛNA Jİ ALİKARİYA WERGÊR.....9

MAFÊ PARASTİNA Jİ TUNDİYÊ

Beşeke girîng ji penaberên [1] LGBTI+ yên li Tirkiyeyê ji bona ku ji ber tundiya li ser bingeha zayendî mafê xwe yê penaberiyê li welatekî din bikar tînin li Tirkiyeyê dijîn. Lêbelê, gelek penaberên LGBTI+ li Tirkiyeyê, welatê ku ew lê penaber bûne, rastî şîdeta li ser bingeha zayendî tên. Di vê nivîsarê de, dê amûrên qanûnî yên ku penaberên LGBTI+ li Tirkiyê dikarin bikar bînin da ku li dijî tundiya li ser bingeha zayendî şer bikin, bêne kurt kirin.

Benda 10an ya Destûra Bingehîna Komara Tirkiyeyê; ewlehî dike ku her kes li pêşberî qanûnê wekhev e, bê cudakariya yaliyê ziman, nijad, reng, zayend, raya siyasî, baweriya felsefî, ol, mezheb û sedemên wek vana. Her çend têgehên meyla cinsî û nasnameya zayendî bi zelalî di vê gotarê de neyên behs kirin jî, lê tê pejirandin ku hevoka "û sedemên wek vana" wan jî vedigire. Di benda 17an da jî tête nîşankirin ku mafê her kesî yê jiyanê, yê nedîtina êşkence û muameleyên xerab û yekbûna laş, parastina hebûna bûjenî û arîşen û mafê pêşve çûyînê. Di van madeyan de peyva "her kes" ne tenê ji hêla hemwelatiyên Komara Tirkiyeyê ve, belkî digel wan, êdî statuya wî çi dibe bila bibe, heya qet tu statuya wî tune be jî wateya wê her kesekê di nav sînorên Komara Tirkiyeyê de heye şamilî teva tê. Li gorî van her du rêziknameyan, bimefer e bê gotin ku; stûbariyên erênî yên dewletê hene ku ji bona her kesê di qada serweriya dewletê de dijî an jî bi rengek demkî lê dimîne pêşî li şîdeta li ser bingeha zayendî bigire, dema ku şiddet rû dide sûcdar ceza bike û zirara qurbanê sax bike. Bi gotinek din, ji bona ku wana peyda bike dewlet mecbûre ku her cûrê tedbîran bigire û nifşên polîtîkayê hilberîne. Wekî din, divê dewlet ne tenê yên ku li dijî kiryarên kesan tundûtûjî hatine kirin biparêze û piştgirî bide wan, lê divê bi xwe jî şîdeta li ser bingeha zayendî li dijî kesî neke. Ji vê re jî stûbariya neyînî tê gotin.

---

[1] Di vê nivîsê de, peyva penaber bê ku bi statuya hiqûqî ya li Tirkiyê ve were bisînorkirin û bi awakî ku Peymana 1951a ya Neteweyên Yekbûyî ya Têkildarî Rewşa Penaberan bê raçevkirin; bi rengekî ku her kesê ji ber sedemên rastê ku ditirse yê zulme bibîne ji bona nijad, ol, netewbûn, endamtiya komeke civakiya kifşe an ramanek siyasî li derveyî welatê ku hemwelatiyê wî ye û nikare ji parastina vî welatî sûd werbigire, an jî ber tirsa navborî naxwaze jê sûd werbigire; an ne xwedî netew be û di encama bûyerên wusa de li derveyî welatê rûniştina xwe ya berê ye, nikare vegere an jî ji ber tirsa navborî naxwaze vegere, bihewîne tê bikar anîn.

Di gava karanîna rêyên hiqûqî yên li jêr hatî şirove kirin da, di rewşa ku serlêder ji ber rewşa penaberiyê, meyla cinsî, an nasnameya zayendî an jî sedemek din were cûdakarî kirin, an karbidestê rayedarê giştî berpirsiyariyên xwe pêk neyne an jî karê xwe nebaş pêk bîne, digel vê di derbarê karbidest da jî dikarin ser lê rêyên huqûqî bidin.

PEYMANA STENBOLÊ

Peymana Konseya Ewropayê ya Têkilî Pêşîlêgirtina Tundiya li Dijî Jina û Şîdeta Malbatî û Têkoşîna li Henber Van (Peymana Stenbolê), ewa ku Tirkiye imzekerê wê yê yekem e, yek ji çavkaniyên qanûniyê girîngtir e ji bo têkoşîna li dijî tundiya li ser bingeha zayendî. Ew ji bo dewletan nexşerêyeke girîng peyda dike ku li dijî tundiyê têkoşîn bikin. Di benda peymanê ya 4/3an da rêziknameya herî fireha ku heya niha ji bo qedexekirina cûdakariyê ya ku di navbera peymanên navneteweyî yên mafên merivan de bi cîh digire. Li gorî vê bendê, bi taybetî tedbîrên derbarê parastina mafên mexdûran yên bên pêkanîn bêyî cûdakarî li ser bingeha meyla cinsî û nasnameya zayendî, statuya koçber an penaber an jî bingehek bi vî rengî.

Di benda peymanê ya 59an da mafê qurbanên şîdetê an zewaca bi darê zorê yên destûra rûniştinê bêyî ji hevjîn an partnerê wan hatine saz kirin. Di benda 60an da qebûlkirina şîdeta li ser bingeha zayendî wekî sedemekî penaberiyê û pêkanîna pêvajoya penaberiyê bi rengekî bihest li hember zayenda civakî hatiye saz kirin. Di benda 61an da jî, prensîba nevegerandinê hatîye rêkûpêk kirin. Lêbelê, Komara Tirkiyê ji 1ê Tîrmeha 2021an vir da, bi biryara Serokomar ji peymana ku bi xwe imzekirê wê yê yekem bû, vekişiyaye. Lê ev rewş berpirsiyarên dewletê yên di derbarê mijara şîdeta li ser bingeha zayendî da ji holê ranake. Ji ber ku çavkaniyên vê berpirsiyarê tenê Peymana Stenbolê nîne, lê gelek çavkaniyên wekî destûr, zagon, qanûnên din û hiqûqa darazê yên ku jê vegerandin bêmefere hene.

PÊŞÎGİRTİNA TUNDİYÊ Û PARASTİNA Lİ DİJÎ TUNDİYÊ

Di qanûna navxweyî de ramana herî girîng ya Peymana Stenbolê Qanûna jimara 6284 ya ku derbarî Parastina Malbatê û Pêşîlêgirtina Êşkenca li Dijî Jina da ye [2]. Li gorî xala qanûnê ya 1an armanca wê ew ku; ji bo parastina jin, zarok, endamên malbatê yên dibe ku şîdetê bibînin û kesên ku dibin qurbanê şopandina yekalî ya bi heter û tedbîrên ku werin girtin ji bo armanca pêşîgirtina şîdeta li dijî van kesan bê rêkûpêkkirin. Her çend di vê bendê de LGBTI+ rasterast bi cîh negirin jî, lê bi taybetî "qurbanê şopandina yekalî ya bi heter" dikarin berfireh bê nirxandin.

Di qanûnê de şîdeta hundurê malê; tête diyarkirin ku tundûtûjiya di navbera malbatê an malê an jî endamên din ên malbatê de çêdibe heke qurban û sûcdar di heman xanî de nebin hevpar. Tundiya li vir hatiye diyarkirin; dibe ku şîdeta fîzîkî, aborî, cinsî an jî hestyarî be. Di rêziknameya nerîta qanûnê de wek şopandina yekalî ya bi heter; bê ku li heyîn û tuneya pêwendî an jî têkiliyek malbatî navbera wan da binêrin, bi hêla mexdûrên şîdetê va, bi awakî ku bibe sedema hestêna tirsê û bêçaretiyê, bi aliyê laş an derûnî, bi rengek ku ji ewlehiyê fikar bike, naverok çi dibe bila bibe, her cûre helwest û tevgerên ku çi bi devkî, çi bi nivîskî û çi jî bi karanîna her awayê ragihandinê lêker di bin zextê de bihêle hatiye salixdan.

Di qanûnê da tedbîrên parastin û pêşîlêgirtinê yên li dijî tundiyê ku dikare ji hêla rayedarên herêmî an dadger ve were dayîn, hatine saz kirin. Biryarnameyên darvekirinê dikare ji dadgeha malbatê ya herî nêz, rayedarên herêmî an yekîneya bicihanîna qanûnê (wekî polîs, cendirme) bêpere were xwestin. Divê bi xurtî were nîşankirin kirin ku; qanûn ji bo biryarên li jêr hatine diyar kirin mercê şandina delîlan nagere.

Li gorî mercên taybetî yên şîdetê an xetera şîdetê, gengaz e ku meriv tenê yek an çend tedbîrên li jêr rêzkirî bistîne. Rayedarê herêmî, parêzgarê parêzgehê an jî qeymeqamê navçeyê ye. Dadwerê ku di qanûnê de tê qesdkirin, ew jî dadrêsê malbatê ye.

---

[2] https://www.mevzuat.gov.tr/MevzuatMetin/1.5.6284.pdf

- Tedbîrên parastinê yên ku dikarin ji hêla rayedarên herêmî ve werin dayîn:

a)Peydakirina cîhê hêwirînê (penageh) ji bo mexdûr an zarokên pê re,

b)Dabînkirina alîkariya darayî ya demkî,

c)Pêşkêşkirina karûbarên rêberî û şêwirmendiya derûnî, pîşeyî, hiqûqî û civakî,

ç)Di rewşa metirsiya li ser jiyanê de, hildana bin parastina demkî,

d)Ger hewce be, dabînkirina firseta kreşê heke mexdûr xwediyê zarokan be, çar meh ji bo piştgirîkirina beşdarbûna wan di jiyana xebatê de, ger mexdûr bi xwe bixebite bi mercê ku bi du meha va sînorkirî bimîne, ji bo yên di ser şanzdeh salî re ne, bi şertê ku her meh ji nîvê miqdarê meaş yê kêmtirê safiyê ku her sal tê kifşe kirin derbas nebe û bi mercê ku bê pelikandin bi awakî ji terazûna Wezaretê were pêşwazî kirin.

Di rewşa awarte de, tedbîrên di bendên (a) û (ç) de hatine diyar kirin bimefer e ku ji hêla fermandarê bazbendê ve jî werin girtin.

- Tedbîrên parastinê yên ku dikarin ji hêla dadger ve were girtin:

a) Guhertina cîhê karê mexdur,

b) Di rewşa ku kes zewicî be, diyar kirina cîhekî rûniştinê ji bilî cihê ku ew bi hev re dijîn,

c) Li gorî mercên ku di Qanûna Medenî ya Tirk ya bi jimara 4721 de hatine diyarkirin, li ser daxwaza mexdûr, dayîna şirova xaniyê malbatê li ser tomara axê,

ç) Ger ji bo mexdûr xetera jiyanê hebe û were fêhm kirin ku tedbîrên din jî ji bo pêşîgirtina vê xeterê têrê nakin û li gorî razîbûna agahdar ya kesê têkildar, guhertina nasnameya fermî û agahî û belgeyên din yên têkildar li gorî Qanuna Parastina Govan ya Jimara 5726.

- Biryarnameyên tedbîra pêşîlêgir yên ku ji hêla dadger ve dikarin were dayîn:

a) Gotin û tevgerên ku li hember qurbanê şîdetê gefên tundiyê, heqaret, rûreşkirin an piçûk xistinê dihêwirînin neyin bikar anîn,

b) Durkirina bilez ji xaniyê hevpar an jî cîhê ku lê ye û dabeşkirina xaniyê hevpar ji mexdûr re,

c) Nêzîknebûna mexdûran, xaniyên ku ev kesan lê dimînin, dibistan an cîhê kar,

ç)Heke berê derbarê zaroka da biryareke avakirina têkiliyên kesane hebe, pêkanîna têkiliyên kesane bi kesekî ra, an sînordarkirina têkiliyên kesane an jî bi tevahî bê rakirin.
d)Ger ku hewce bê dîtin, her çendî şîdet nedîtibe jî, nêzîkî mexdûr, xizm, şahid û bi qeyda ku hukmên Qanûna Medenî ya Tirk veşartî bimîne zarokan nebe,
e)Zirarê nede eşyayên kesane yên mexdûr û tiştên mala wî,
f)Bi wesîteyên ragihandinê an bi rengek din mexdûr ne rihet meke,
g)Teslîm kirina çek bazbend,
x)Her çend ew wezîfeke giştî pêk bîne jî, çeka ku ji ber vê wezîfê heye teslîmî saziya xwe bike,
h)Li cîhên ku mexdûr li be alkol an maddeyên tevizker an jî yên hişyarker bikar neyîne, an dema ku di bin bandora van meddeyan da be nêzî kesên têne parastin û cîhên ku ewna lê ne nebe, ger bengîtiya maddeyan hebe, tevî razana di nexweşxanê da jî tê da, peydakirina muayene û dermankirinê,
ı)Serlêdana saziyek tenduristiyê ji bo muayenekirin an dermankirinê û dayîna dermankirinê.

Di rewşa awarte de, tedbîrên di bendên (a), (b), (c), (d) de hatine diyar kirin bimefer e ku ji hêla fermandarê bazbendê ve jî werin girtin.

Di bûyera şîdetê an jî hebûna xetera şîdetê de, her kes dikare vê rewşê ragihîne meqam û rayedarên fermî. Rayedarên giştî yên ku agahdariyê werdigirin berpirsîyar in ku peywirên xwe bê derengî bicîh bînin û der barê tedbîrên din yên werin girtinê de rayedaran agahdar bikin.

Biryarên bergiriyê ji bo demekî û herî zêde 6 meh têne dayîn. Ger hewcedariya bergiriyê bidome, berî ku dema wê bigihêje bidawiyê, divê serî li dadgeha malbatê were dayîn û domandina biryara bergiriyê were xwestin.

Di rewşa ku kiryarker biryarê binpê bike, mafê mexdûr heye ku serî li dadgeha malbatê bide û daxwaz bike ku kiryarker bi binçavkirina dîsîplînê were cezakirin. Maweya girtina cezayê dîsîplînê di navbera 3 roj û 10 rojan de ye. Di her dubarekirina dijraberiyê de serlêdana di vî warîda bimefer e.

CEZAKİRİNA KİRYARÊ ŞÎDETÊ

Kîjan tevgeran tawanek pêk tîne û kirdarî dê çi be di qanûnan da hatiye rêkûpêk kirin. Zagona herî girîng ya ku di vî warî de bê vekolandin, Qanûna Cezaya Tirk ya bi jimara 5271 ye. Ev nota agahdariyê di çarçoveyek gelemperî de armanc dike ku xwedanên mafan bên agahdar kirin û tête pêşniyar kirin ku di derbarê mijara ka çi tawanek e û li dijî kiryara tawanbar çi rê divê bê şopandinê de bi pisporekî re were şêwirîn.

Qanûna Cezayê ya Tirk (QCT), ji bo kiryarên ku li Tirkiyê pêk tên an kiryarên digihêjine encamekî têne sepandin. Kiryarên ku di zagonê de wekî tawan têne rêkûpêk kirin bi sereke ev in: Kuştin, birîndar kirin, beralîkirina xwekujiyê, heqaret, gef, xirabkirina aştî û aramiyê, pêşîgirtina azadiya kar, sûcên li dijî parastina cinsî, êşkence, muameleyên xirab, binpêkirina berpirsiyara malbatê, bêparkirina ji azadiya kesane, binpêkirina parastina malê, binpêkirina nepeniya jiyana taybet, dizî, sextekarî û hwd.

Dema ku rastî şîdetê werin, dikarin biçin qereqol an jî dozgeriya herî nêz û bêyî ku tu dravî bidin gilî bikin. Bimefer e ku gilî bi daxwaznameyek nivîskî an bi awayekî pêgirtkirina daxuyaniyên devkî bi aliyê karbidestan va were kirin. Çalakiya tundiya ku bûye û hûrguliyên wê, agahiyên ku di derheqê kiryarker de tên zanîn, cîh û dema bûyerê divê li vir têne diyar kirin. Di dema gilînameyê de pêşkêşkirina delîlên wekî rapora bijîşkî ya ku şîdetê dipelikîne, peyam, wêne an dîmenên vîdyoyê, agahiyên nasname û ragihandinê yên derbarê şahidan girîng in ji bo darizandin û cezakirina kiryar.

BIYANİ Û HİQÛQA PARASTİNA NAVNETEWEYÎ

Di navbera “kesên xwedan hewceyên taybetî” da yên ku di zagonê de hatine diyarkirin, kesên ku rastî tundiya derûnî, laşî an zayendî hatine cîh digirin. Di benda Qanûnê ya 67an de hatiye diyar kirin ku ji merivên xwedan hewceyên taybetî ra di maf û rêgezên de pêşengî were dayîn û dê derfetên guncan werin peyda kirin ji bo ku zirara dema rastî şîdetê hatiye çêbuye bê dabînkirin. Di benda Qanûnê ya 55/d de hatiye diyar kirin ku ji bo mexdûrên şîdeta psîkolojîk, laşî an zayendî heya dermankirina wan xelas nabe biryara dersînorkirinê nayê dayîn.

ZÎYANŞÛNDEDANİYA ZİRARA HATÎ DAYÎN

Ger zirara bûjenî û/an ya arîşen ji ber kiryarên tund pêk hatibe, mafê mexdûr heye ku li dijî kiryarker doza zîyanşûndedaniya bûjenî û ya menewî li Dadgeha Destpêkê ya Sivîl veke. Di encama giliyê tawanê de kiryarker tawanbar bê dîtin û cezakirin jî, ev rewş rasterast ji mexdûr ra tezmînatê pêk nayîne. Divê mexdûr doz veke da ku tezmînatê bistîne. Dema ku doz vedibe, divê di daxwaznameyê da ya ku ji dadgehê re hatiye nivîsandin bûyer bi rêza kronolojîk were vegotin û delîlên ku bûyeran îspat dikin li daxwaznameyê werin zêdekirin. Her çend lêpirsîna, doza ku digel danezana tawanbarî /gilê va hatî destpê kirin neyê vekirin, ango heke ew bi nedarizandin encam bide an kiryarker di doza tawanbariyê de rizgar bibe jî, heke merc pêk werin, mafê wî heye ku tezmînatê bistîne bi doza ku li Dadgeha Destpêkê ya Sivîl bê vekirin.

Gava ku ev dozê tê vekirin, divê hin lêçûnên dozê di pêş de werin dayîn. Lêbelê, bimefer e ku kesên nekarin van lêçûnan bidin, dozê bi "daxwaziya alîkariya hiqûqî" vekin. Bi vî rengî, heke dadgeh vê daxwazê qebûl bike, mimkûn e ku meriv bêyî dayina heqê dozê doz veke. Divê ev daxwaz di daxwaznameyê de bi zelalî were diyar kirin û belgeyên ku nekariya dayinê nîşan didin divê werin vegirtin. (Mînakî; tomarên bîmeyê nîşan didin ku ew ne xwediyê kar e, ne xwediyê dahatek birêkûpêk e, an jî têrê nake)

Di gava vekirina dozê de sûdwergirtina ji alîkariya parêzerekî, ji bo xwediyê maf mafên xwe winda neke û bigihêje mafên xwe pir bikêr tê. Kesên ku dikarin heqê parêzer bidin, dikarin mûçeya parêzerekî bidin û pê re bixebitin. Kesên ku nekarin vî heqî bidin, dikarin serî li karûbarê alîkariya hiqûqî ya baroya parêzgeha xwe bidin û daxwaza tayînkirina parêzerek bikin.

MAFÊ SÛDMENDBÛNA JÎ ALÎKARÎYA WERGÊR

Di gava pêvajoyên danezana tawanbarî, giliyê kirin û daxwazkirina tedbîran da yên ku li jor hatine behs kirin, li gorî benda 202 ya Qanûna Doza Ceza ya bi jimara 5271, “kesên ku wekî daxwazên xwe vebêjin Tirkî baş nizanin” bi alîkariya wergêrekî bêpere têne sûdwergirtin.

Di doza ji bo ziyana darayî û menewî de jî, di gava danişînên ku piştî doz hat vekirin bên dîtin, li gorî benda 263an ya Qanûna Dadrêsî ya Huqûq bi jimara 6100, yên ku bi Tirkî nizanin bi alîkariya wergêr têne sûdwergirtin.

NÎŞEKE GİRÎNG: Mafên ku di vê nîşeya agahdariyê de hatine behs kirin û pêvajoyên hiqûqî yên ku dikarin werin meşandin di çarçoveya rêzikên qanûnî de têne kurt kirin. Bi rengekî taybetî her bûyereke berbiçav, dibe ku hûrgulî û mercên hiqûqî yên di derbarê pêvajoyê de hebin ku li vir nehatin girtin. Ji ber vê yekê, pir girîng e ku meriv ji destegiriya pisporekî qanûnî sûd werbigire. Kesên ku mûçeya ji bo destegiriya pisporan pêdivî nikarin bidin, dikarin serî li baroyan û saziyên sivîl yên şêwirmendiyê dikin bidin.

Ji bo agahdariyê
info@unikuir.org

Ji bo şêwirmendiya Psîko-Civakî û Hiqûqî
danisma@unikuir.org

http://unikuir.org

https://twitter.com/unikuir
https://www.instagram.com/unikuir/
https://www.facebook.com/unikuir/